Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com ☎ 423165

# Ji 10 salî ve xêz dike

**Fatma Ayid Mihemed bi dilsoziyeke mezin dest bi xêzkirina wêneyan dike, bi tiliyên xwe yên afirîner reng, xweşî û êşa jinan xêz dike.**

Fatma Ayid Mihemed bi dilsoziyeke mezin dest bi xêzkirina wêneyan dike, bi tiliyên xwe yên afirîner reng, xweşî û êşa jinan xêz dike. Fatma Ayid Mihemed 36 salî ye û ji 10 saliya xwe ve wêneyan xêz dike. Piştî ku şoreşa Rojavayê Kurdistanê pêk hat, Fatma Ayid Mihemed jî dikaribû, hîn zêdetir di aliyê wênexêziyê de xwe bi pêş bixe. Îro jî Fatma dikare êş, azar, xweşî û kêfxweşiya jinan bi pênûsa xwe xêz bike. Fatma Ayid Mihemed ruxmê di destê wê de nexweşiya pênceşêrê heye jî dest ji xêzkirina wêneyan bernedaye. Fatma Ayid Mihemed der barê hunerê xwe de nihêrîna xwe anî ziman.


### Destpêkê çiya, mal û xweza

Fatma Muhemed dibêje, "Destpêkê min amûrên wêneyan anîn û min wêneyên çiya, mal û xwezayê xêz dikirin, û min pirr ji wêneyan hez dikir. Di destpêka her karî de zehmetî heye, lê piştre, hêdî hêdî ev kar ji min re hêsan hat. Piştî ku ez hînî wêneyan bûm, min wêneyên jinan xêz dikirin, ji ber ku jin jiyan e û min pirr dixwest ez wêneyên jinan xêz bikim."

### Nexweşiya pençeşêrê jî nebû asteng

Nexweşiya pençeşêrê li destê Fatma Muhemedê da, lê wê ti caran ev nexweşî li pêşiya hunerê xwe astengî qebûl nekir. Ew dibêje, "Tevî ku di destê min de nexweşiya pênçeşêrê heye jî ev yek li pêşiya xêzkirina wêneyên min, ne asteng e. Hezkirina min ji wêneyan re pirr heye û ev daxwaza min bû ku ez wêneyan xêz bikim. Niha ez 36 salî me û heta niha ez wêneyan bi hezkirin û dildariyeke mezin xêz dikim. Ez bi karê xwe serbilind im û bi hêvî me ku her kes karê ku dizane bike."

*JINHA*


Fatma Ayid Mihemed

# Hem dijene hem dibêje

**Ez wek kesayet, ji stiranên foklorî gelek hes dikim. Herwiha ez ji dengbêjiyê jî gelek hes dikim. Gotina stiranan û derxistina holê ya behremendiya huner, ne şerm e û ez dixwazim kesên ku xwedîhuner şerm nekin û behremendiya xwe derxin ser dikê.**

Her mirov, dema têdigihîje, gelek behreyan li cem xwe çêke, di gelek waran şareza û jêhatî bibe. Hin mirov jî hene ku bi dengê xwe yê zîz hunermendiyê hildibijêrin. Yek ji wan jina ciwan Mîrav Silêman e, wê di 13 saliya xwe de dengê xwe û elaqeya xwe ya bi tembûrê re kifş kiriye.
Niha jî hem tembûrê dijene, hem jî stranan dibêje. Mîrav Silêman ji Qamişloyê, yanî li navenda Rjava, li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ye û ev sê sal in bênavber stranan dibêje û li tembûrê dide. Mîrav Siêman li ser karê xwe nihêrîna xwe bi me re parve kir.

### Bi tembûrê dengê wê xweştir bûye



Mîrav Silêman dide zanîn ku ew ji 13 saliya xwe ve hînî jenîna tembûrê û gotina stranan bûye û wiha dewam dike: "Ez ji bajarê Qamişloyê me û ez 16 salî me. Ez ji zaroktiya xwe ve stranan dibêjim, distirêm. Her ku temenê min mezin bû, min xwest dengê xwe yê xweş, bi tembûrê re bikim yek.
Niha ez hem li tembûrê didim, hem jî distirêm. Helbet heval û malbatên me, mirovan teşwîqî karên wiha dikin, ya min jî malbata min gelekî destek dan min da ku ez hem li tembûrê bidim, hem jî bistirêm. Stran dema bi amûrê re dibin yek, xweştir dibin. Min dema dest bi tembûrê kir û ez hîn bûm, pê hesiyam ku dengê min xweştir dibe. Niha jî ez dikarim bibêjim, tembûr û stran di jiyana min de cihê wan cuda ye."

### 'Gîtar û kemançe bala min dikişînin'

Mîrav Silêman diyar dike ku di her karî de zehmetî hene û wiha dibêje, "Helbet di her karî de zehmetiyek heye. Dema min jî dest bi lêxistina tembûrê û gotina stranê kir, min jî zehmetî dîtin. Lê gava ez hîn bûm, zehmetî ji ber xwe ve derbas bûn, çûn. Her wiha hin kes hebûn ku ji min re digotin stran û amûrên muzîkê zehmet in, heta tu bi pêş nekevî lê min israr kir ku ez dengê xwe yê xweşik bi amûrê re bikim yek. Piştî ku malbatê alîkariya min kir, min zehmetiya heyî li pey xwe hişt. Niha jî gîtar û kemançe bala min dikşînin û ez ê di dema pêş de xwe hînî wan amûran jî bikim."

### ´Ez bi karê xwe serbilind im'

Mîrav Silêman wiha qal dike ka çawa hîn bûye li tembûrê bixe: "Dema xwesteka mirovan hebe, wê zûtir hînî tişta ku dixwaze bibin. Ez jî nêzî 2 mehan çûm perwerdeya tembûrê, piştî ku ez ziravtiya tembûrê hîn bûm, min roj bi roj bipêşketinên ber bi çav bi dest xist. Niha ez xwe bi xwe perwerde dikim û tişta herî xweş ew e ku mirov perwerdeya xwe dewam bike. Hezkirina min ji hunerî re hişt ku ez bi pêş bikevim. Ez serbilind im ku hînî gotina stran û lêdana temûrê bûme."
Mîrav Silêman dibêje, ew dixwaze weke Mihemed Şêxo, Zibêr Salih û Hozan Dîno li tembûrê bide û stranan bibêje û gotinên xwe wiha bi dawî dike: "Daxwazeke min a esasî ew e ku jinên baweriyê bi xwe tînin ku stranên xwe bibêjin, bila stranan bibêjin. Ez wek kesayet ji stranên foklorî gelekî hez dikim. Her wiha ez ji dengbêjiyê jî gelekî hez dikim. Gotina stranan û derxistina holê ya behremendiya hunerî, ne şerm e û ez dixwazim kesên ku xwedî huner in û şerm dikin, şerm nekin û behremendiya xwe derxin ser dikê. Ez gelekî ji hunermend Mihemed Şêxo, Zibêr Salîh û Hozan Dino hez dikim, ew jî bi tembûrên xwe stranan dibêjin; û ez dixwazim weke wan hem li tembûrê bidim, hem jî stranan bibêjim."

*JINHA*

## Quncika Têgînan

| | |
|---|---|
| Hêman | **Bingeh, hîm, xîm, esas. Bernameya xwe li ser hêmaneke xurt çêkiriye.** |
| Koalisyon (Fransî) | Yekîtiya ji çend hêzan pêk tê, rêveberiya hevbeş: Welat bi koalisyonê tê birêvebirin. Itîlaf. |
| Restore (Fransî) | Çêkirina deverên xerabûyî yên avayiyekê, Nûkirin: Keleha Elodîno hat restorekirin. |
| Rêgez. | Fikirê bingehî, baweriya bingehî. Prensîb, mebde: Rêxistineke xwedîrêgez e. Miroveki xwedîrêgez e. |
| Stad/Stadyom (Fransî) | Ciyê lîstina taximan, ciyê pêşbirka lîstikên sporê, ciyê merasiman. Qad, sahe: Du taximên futbolê li stadyoma Qamişlo hatin hemberî hev. |
| Tîm (Ingilîzî) | Yekîneyeke futbolê û lîstikên din. Du tîmên futbolê hatin hemberî hev. Ferîq. |
| Turnuva (Fransî) | Rêzepêşbirkên bi dorê di navbera tîmên sporê de tên lidarxistin. Mûsabeqe. |
| Tûnel (Fransî) | Riya di bin erdê de, riya hawîrdorê wê girtî. Ji bo kurtkirina rê di çiyê de tûnelek hat vekirin. |
| Werziş | Spor. |
| Werzişvan | Kesê sporê dike. |

## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | T | O | ■ | A | R | D | ■ | K | Î |
| 2 | ■ | D | Î | L | ■ | A | Z | A | D |
| 3 | S | E | R | A | D | ■ | O | ■ | I |
| 4 | A | ■ | O | ■ | E | S | M | E | R |
| 5 | F | A | ■ | S | P | Î | ■ | L | ■ |
| 6 | ■ | A | B | O | R | ■ | B | A | C |
| 7 | A | ■ | A | L | E | M | ■ | F | E |
| 8 | S | A | L | ■ | Ş | E | K | ■ | J |
| 9 | A | D | E | M | ■ | D | Ê | H | N |

## Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | ■ | | | | ■ | | |
| 2 | | ■ | | ■ | | | | | |
| 3 | ■ | | | | | ■ | | | ■ |
| 4 | | ■ | | | | | | ■ | |
| 5 | | | ■ | | ■ | | | | |
| 6 | | | | | | | ■ | | ■ |
| 7 | ■ | | ■ | | | | | ■ | |
| 8 | | | | ■ | | ■ | | | |
| 9 | | | ■ | | | | | ■ | |

### ÇEP-RAST

1. Hejmarek... Edalet... Notayek
2. Roja piştî betlaneyê
3. Birûmet, birêz... Cihê herandinê
4. Esîlza, zadegan
5. Di zimanê zarokan de lêxistin... Newaya nivandina zarokan
6. Tevahiya nivîsarên efsane, felsefeya Îbranî û û fermanên dînî ku ji devan gihîştiye devan
7. Mektûb
8. Pêşgireke lêkerçêker e û wateya berbijoriyê didê... Hesinê ku li binê piyê hespan dixin
9. Baneşana kêfxweşiyê... (Ehmedê …) Nivîskarê pirtûka 'Mem û Zîn'ê

### JOR-JÊR

1. Notayek... Fen û fût, hîle... Baneşana ku pê ga tê ajotin û sekinandin
2. Cureyekî solên berê
3. Kesê ku libat û tevgerên wî ji adet der in
4. Poşman
5. Mehek... Dua, niyaz
6. Hejmarek... Bajarekî me
7. Tiyatro... Cephe, bere
8. Dijberê rengî spî... Yezdanekî misrî
9. Cînavka pirhejmariyê ya xwerû... Pirsek di rewşa ne tewandî de... Beyreq, sembola welatan

# 'Dagîrkeriya li ser Kurdistanê tecrîda li ser Rêber Apo ye'

Welatiyên bakur û rojhilatê Sûriyê gotin, dewleta Tirkan ya dagîrker û hêzên komploger, ti caran naxwazin gel azad bibe. Ji ber wê tecrîdeke girankirî li ser Rêber Apo dimeşînin û bi dîlgirtina Rêber Ocalan qirkirina Kurdan dikin armanc. R-5




Ronahî — Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 961 8-Gulan- 2022 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

## 'Yekîtiya jinên azadîxwaz binketina dagîrkeriyê ye'



Şervanên Yekîneyên Parastina Jinan (YPJ) êrişên deweleta tirkî ya dagîrker şermezar kirin û banga xurtkirina têkoşîna azdiyê kirin. R-4

# Aqilê ji kîsê neyar dijminê gelê xwe




Nûrî Malikî rast dibêje
Sîpan Şînda
R-7



Dîsa Şingal
Faruk Sakik
R-5



Konsept mezin e armanc jî yek e
Idrîs Henan
R-4



## `Divê wijdana cîhanê qirkirineke nû li Şingalê qebûl neke`

Endama Baroya Yekîtiya Jinên Êzîdî got, Rêveberiya Xweser ya demokaratîk ya Şingalê Hêviya gelên Iraqê ye. Ji ber wê bi orgenîzekirina dewleta tirkî ya dagîrker û pêkanîna hevkarên wê qirkirna Êzîdiyan didominin. Lê divê wijdana cîhanê qirkirineke nû ya Êzîdiyan qebûl neke. R-5

## QSD`ê bîlançoya êrişên meha Nîsanê yên li ser herêmê eşkere kir

QSD`ê bîlançoya êrişên dewleta Tirkan ya dagirker yên li dijî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê yên di Nîsanê de eşkere kir. QSD`ê da zanîn ku êrişa dewleta tirkî yên ser herêmê sûc e û got, ev êriş bi armanca zindîkirina DAIŞ'ê tên kirin. Herwiha da xuyakirin ku piştî êrişên dewleta tirkî DAIŞ'ê jî dest bi êrişan kir. R-2

## PDK Hespekî trûva ye

Dewletên Kurdistanê di binê dagîrkeriyê de digirin, raperînên ku bi hêza xwe ya cewherî nikarîne bitepisînin, xiyanet xistine dewrê û wisa têk birine. Sedema ku ji Harpagos heta îro Kurd ne azad in ew e ku li Kurdistanê xiyanet kirine şêwazeke jiyanê. R-6

## Amadekariya Pêşangeha Yekê Ya Pirtûkên Kurdî

Desteya Çandê ya Herêma Cizîrê amadekariya Pêşangeha Yekê Ya Pirtûkên Kurdî dike. Pêşangeh wê li Qamişlo be û 3 rojan dewam bike. R-7




## Pêşmergeyê Dêrîn: Li hemberî dagîrkeriya dewleta tirkî serî rakin û piştgiriya PKK`ê bikin

Mam Hidayet got, dewleta tirkî ya dagîrker dijmina gelê Kurd e. Dixwaze seranserê Kurdistanê dagîr bike û Kurdan qir bike. PKK jî têkoşîna azadiya gelê Kurd dike. Ji ber wê divê em piştgiriya PKK`ê bikin û li hemberî dagîkeriyê serî rakin. R-4



# QSD`ê bîlançoya êrişên meha Nîsanê yên ser herêmê eşkere kir

QSD`ê bîlançoya êrişên dewleta Tirkan ya dagîrker yên li dijî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê yên di Nîsanê de eşkere kir. QSD`ê da zanîn ku êrişa dewleta tirkî ya ser herêmê sûce û got, ev êriş ji bo zindîkirina DAIŞ'ê tên kirin, her wiha da xuyakirin ku piştî êrişên dewleta tirkî DAIŞ'ê jî dest bi êrişan kirin.

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

Navenda Ragihandinê ya Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) îro bi daxuyaniyekê bîlançoya êrişên dewleta Tirk a dagirker ên li dijî Bakur û Rojhilatê Sûrî yên di meha Nîsanê de eşkere kir.

Daxuyanî wiha ye:

"Dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê ev demeke dirêj e sûcan li dijî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêk tînin, nexasim herêmên li eniyên şer, gund û bajaran rojane êrişên bejahî û hewayî pêk tînin û sivîl dibin qurbanî. Lê ji ber mijûlbûna cîhanê bi şerê li Ukraynayê, dewleta Tirk a dagirker êrişên xwe li dijî herêmê zêde kirin û ev yek bi kar anî û dest bi planên dagirkirinê yên nû kir.

Di Nîsanê de hemwextî gefên çeteyên DAIŞ`ê ku yên destpêkirina şerê "El-Sair Lîlşêxên" anku "Tolhildana Herdu Şêxan", dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê bi çekên giran û bi balafiran êrişên xwe zêde kirin. Li rex wê jî dezgehên çapemeniyê yên Tirkiyê dest bi propagandayê kir ku gelek windahiyên di nava refên me yên leşkerî de çêbûne û gelek nûçeyên derew belav kirin. Li kêleka wê jî dewleta Tirk hemû pêkhateyên herêmê û kêmneteweyên wê kirin hedef nexasim gundên asûriyan, koçberên Efrînê yên li Şehba, Eyn Îsa, gundên Girê Spî û Minbicê.

Êrişên dewleta Tirk a dagirker li dijî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê armancên wê yên qirêj radixin pêş çavan, nemaze ku jîngehan dike hedef, da ku şêniyan neçar bike ku koçber bibin û malên xwe terk bikin.

Di Nîsanê de dewleta Tirk a dagirker li Zirgan, Til Temir, Eyn Îsa, gundewarê Girê Spî, Minbic, Şehba û Kobanê bi hezaran ton taqemenî bi ser malên sivîlan de berdan û zirarên mezin gihîştin mal û milkên wan. Her wiha nehişt sivîl biçin nav mezreyên xwe, vê yekê bandor li saziyên Rêveberiya Xweser kir ku ji ber êrişên domdar xebatkarên saziyên kehrebeyê û avê, dibistan û mizgefan nekarîn xebatên xwe bigihînin serî.

Dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê pîroziya meha Remezanê jî paşguh kir û rojane herêm kir hedef û peydakirina pêdiviyên jiyanê zehmettir kir, bi taybet li eniyên şer. Şerên di navbera komên çeteyan de li herêmên dagirkirî jî azarên welatiyan zêde kir nemaze yên şêniyên resen ên wan herêman.

Bîlançoya êrişên dewleta Tirk a dagirker ên Nîsana 2022`an, wiha ye:

596 êrişên bejahî yên bi top, tank û obîsan
13 êrişên bi balafirên bê mirov yên bi çek
2 êrişên bi balafirên bê mirov yên xwekuj
3 êrişên bi moşekan
19 sûîqast
122 êrişên din bi doçka, êrişeke bi çeka BKC

Miqdara taqemeniya ku dewleta Tirk a dagirker di êrişên li dijî malên welatiyan û zeviyên wan de bi kar anîne: 23 ton
36 mal zirar dîtine
3 sazî (kehrebe, dibistan û saziya avê) zirar dîtine
2 sivîl şehîd bûn
5 şervan şehîd bûn
23 welatî birîndar bûn

Gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê li benda nûçeyên xweş in ku rêxistinên hiqûqî û civaka navneteweyî dewleta Tirk û çeteyên wê ji ber sûcên li dijî wan kirine, hesab jê bixwazin. Her wiha li bendê ne ku hêzên garantor gavên pratîk bavêjin. Her wiha fişarê li dewleta Tirk a dagirker bikin da ku komkujiyên dîtir pêk neyne û dagirkeriya xwe li herêmên Sûriyê bi dawî bike."

# Li Mizgeftê projeya çandina bi hezaran daran bi dawî bû

**Desteya Rêveberiya Herêmî û Jîngehê ya herêma Cizîrê armanc dike ku zeviyên çandiniyê li herêmê zêde bike. Di vê çarçoveyê de projeya avakirina daristaneke sînaî li Mizgeftê ya li gundewarê Tirbespiyê bi dawî bû.**

Desteya Rêveberiya Herêmî û Jîngehê ya herêma Cizîrê, bi koordîneya bi Rêveberiya Çandinî û Avdanê re ji meha Nîsanê ve, projeya avakirina daristaneke sînaî li herêma Mizgeftê ya bakurê rojhilatê navçeya Tirbespiyê ya Qamişloyê bi dawî kir.

Desteyê bi rêya gerînendetiyên jîngehê yên girêdayî wê armanc dike ku rûberên çandiniyê û kesk li herêmê zêde bike. Da ku pêşî li çolistanê bigire, avhawa û qirêjiya jîngehê baş bibe.



Li daristana sînaî ya Mizgeftê 3 hezar û 430 darên hawirdorê li rûberek ji 4 hektar hatin çandin.

Ew dar bi jenetoran ku avê ji bendavê dikişînin tên avdan û bi rêya boriyan digihîne daristanê.

Proje bi beşdariya pispor, endezyarên çandiniyê, pisporên avê û koordînaya daristanên sînaî, di çend qonaxan de hat pêkanîn.

Hevserokê Desteya Rêveberiya Herêmî û Jîngehê ya herêma Cizîrê, Silêman Ereb ji ANHA'yê re got: "Ev yekemîn proje li herêma Cizîrê ye ku li gorî avhaweya herêmê ye û armanca wê ya sereke zêdekirina rûberên çandiniyê ye."

Silêman Ereb bal kişand ser girîngiya daran û zêdebûna wan li her herêmekê û piştrast kir ku ew di paqijkirina



hawayê de dibe alîkar.

Ereb diyar kir ku deste hewl dide projeyên mîna vê li Dêrik û Çilaxa de jî pêk bîne.

Piştî ku Desteya Rêveberiya Herêmî û Jîngehê proje bi dawî kir, radestî Desteya Çandinî û Avdanê kir, da ku xizmetî wê bikin.

Rêveberiya Xweser piştgirî dide însiyatîfên ku çandina daran li herêmê teşwîq dikin. Silêman Ereb bal kişand ser ku ew amade ne însiyatîfan li dar bixin, avê dabîn bikin û piştî çandina daran parastina wan bikin.

Gerînendetiya Jîngehê ya herêma Cizîrê gelek caran dest bi pêngava paqijkirina Mizgeftê kiribû û bang li welatiyan kiribû ku girîngiyê bidin paqijiyê û parastina daran.

**ANHA**

# Polîsên Tirk dor li Navenda Giştî ya HDP'ê girtin

**Ji ber komek ku li pêşiya Navenda Giştî ya HDP'ê civiya, polîsan dor li avayiyê girt. Amirê polîsan gef li Ayşe Acar Başaran ya HDP'yî xwar û jê re got, ezê te li bin guhê dîwêr bixim.**

Di bin ewlehî û parastina polîsan de komek anîn ber Navenda Giştî ya Partiya Demokratîk a Gelan û xwestin çelengê deynin ber avahiyê û daxuyaniyekê bide. Koma ji 3 kesan ku îdîa dikir zarokên wan li nava PKK'ê ne, bi alên Tirk daxuyanî da û piştre çû. Tevî vê yekê jî polîsên Tirk li ber avahiyê sekinîn. HDP'iyan diyar kirin ku polîs dixwazin li pêşiya avahiyê provokasyonê bikin û nerazîbûn nîşan dan. Polîsan jî bi devkî û fîzîkî êrişî HDP'iyan kirin. Berdevka Meclîsa Jinê ya HDP'ê û Parlamentera Êlihê Ayşe Acar Başaran nerazîbûn nîşanî provokasyona polîsan da û xwest daxuyaniyê bide çapemeniyê. Dema ku Acar Başaran got, "Ez ê daxuyaniyê bidim" polîsan çapemenî ji herêmê dûr xistin. Ji bo Acar Başaran jî got, "Wekîl bixin hundir." Başaran axaftina xwe dewam kir û got, "Polîs ji bo provokasyonê bike hatiye ber avahiya me. Çelengek heye, polîs ji bo parastina vê çelengê hatiye wezîfedarkirin. Ji xwe re maf dibînin ku êrişî me bikin."

Başaran bi biryardarî xwest daxuyaniyê bide û got, "Mafê min ê demokratîk asteng dikin. Em ê li hemberî provokatoran û êrişan têk neçin."

Amîrê polîsan jê re got, "Bêje ku zarokên van li ku ne." Başaran jî bavê xwe yê ku di salên 1990'î de bi kiryar nediyar hate kuştin bi bîr xist û got, "Wê demê li kujerê bavê min jî bipirse."

Li ser vê bersiva Başaran polîsan heqaret lê kir û ji Başaran re got, "Ez ê te li bin guhê dîwêr bixim."

Başaran û endamên HDP'ê nerazîbûn nîşanî polîsan dan.

Dorpêça polîsan a li ser Navenda Giştî ya HDP'ê dewam dike. HDP'î jî dirûşma "HDP gel e gel li vir e" diqîrin.

***ANF***





# Amadekariya Pêşangeha Yekê Ya Pirtûkên Kurdî

Desteya Çandê ya Herêma Cizîrê amadekariya Pêşangeha Yekê Ya Pirtûkên Kurdî dike. Pêşangeh wê li Qamişlo be û 3 rojan dewam bike.

Desteya Çandê ya Herêma Cizîrê dê di 15`ê Gulanê de anku di Cejna Zimanê Kurdî de, yekemîn Pêşangeha Pirtûkên Kurdî li Rojavayê Kurdistanê veke.

Li gorî Desteya Çandê pêşangeh 15-18`ê Gulanê li Navenda Mihemed Şêxo ya Çand û Hunerê ya Qamişloyê ye. Têkildarî bername û hûrgiliyên yekemîn pêşangehê hevseroka Desteya Çandê ya Herêma Cizîrê Rewda Hesen ji ajansa me re axivî.

Rewda Hesen got: "Îsal bangewaziyên hezkiriyên zimanê kurdî li ser medyaya sosyal hebûn, ji bo vê yekê me xwest vê pêşangehê vekin. Her wiha da ku bêhtir zimanê kurdî bikeve nava pêşketinê, ji ber vê jî wê di pêşangehê de pirtûk bi hemû zaravayên kurdî hebin, ev yek jî dê ji bo naskirina zaravayan ji aliyê nifşên nû e, derfetek be."

Rewda Hesen destnîşan kir ku armanc ji vekirina pêşangehê derxistina berhemên nivîskarên Kurd, ji bo nifşên nû ku di dibistanên Rojava de perwerdeya bi zimanê kurdî dibînin.

Têkildarî amadekariyan Rewda Hesen da zanîn ku di nava amadekariyan de Dîwana Wêjeyê, Yekitiya Rewşenbîran a Herêma Cizîrê, Yekitiya Nivîskarên



Kurd li Sûriyê, Saziya Zimanê Kurdî û weşanxaneyên Neqiş, Şilêr, Ava û Mezopotamya hene.

Girêdayî şert û mercê qebûlkirina pirtûkan di pêşangehê de Rewda Hesen got: "Ji bilî dagirtina lîsteya pêşwazîkirinê tune ye; ew jî me ji bo naskirina hejmar û nasandina wan




sazî, kesayet, weşanxane û navê pirtûkan e."

Rewda Hesen di axaftina xwe de destnîşan kir ku pêşketina zimanê kurdî li Rojava bi saya hewldanên Desteya Perwerde û Fêrkirinê pêk hatiye û wiha got: "Hêviya me ew e ku pêşangeh bi dilê civakê be."

***ANHA***

# 150 kulîlkên Mexmûrê

**Ji bo xwegihandina vê zanistê destpêkê em deyndarên avakerê azadiyê, Rêber Apo ne. Weke din, wek xwendekar, mamoste û gelê li vir amade, em deyndarên wan kesan in, ku îro li her çar aliyên welat li ber xwe didin, têdikoşin û ji bo me canê xwe didin.**

Li Wargeha Penaberan a Mexmûrê, 150 xwendekarên ku dibistana Amadeyî (lîse) qedandin, bi merasîmekê hatin pîrozkirin û mezûn bûn.

Li Wargeha Penaberan a Şehîd Rustem Cûdî (Mexmûr) 150 xwendekarên Dibistana Amadeyî ya Şehîd Koçerîn ku dibistana Amadeyî qedandin, mezûn bûn. Doh na pêr, êvarê ji bo xwendekaran şahiyeke pîrozbahiyê hate lidarxistin, tevî malbatên xwendekaran, bi sedan kes tevlî şahiyê bûn.

Beriya pîrozbahiyê rêz ji bo şehîdên Tevgera Azadiya Kurdistanê hat girtin. Piştî wê, ji Rêveberiya dibistana Şehîd Koçerîn, Mustefa Ergen axaftinek kir.

### Deyndarên Rêber Apo ne



Mamoste Mustefa, destpêkê bixêrhatina xwendekar, mamoste û malbatên amade kir û got, "Îro rojeke girîng e ji bo asta refên çar ku xwendina xwe ya 12-13 salan temam kirin. Îro dawîhatina li xwendina wan a beşa amadeyî ye. Ji bo wê, di dirêjiya salên perwerdê de gelek tecrûbe û zanistên cûda bi wan re çêbûn. Ji bo xwegihandina vê zanistê destpêkê em deyndarê mîmarê azadiyê, Rêber Apo ne. Wekî din, weke xwendekar, mamoste û gelê li vir hazir, em deyndarên wan kesan in, ewên ku îro li her çar aliyê welat li ber xwe didin, têdikoşin û ji bo me canê xwe didin. Beriya hertiştî ev ked û zanabûn a wan e. Divê beriya her tiştî em di pêkanîna tecrûbeyên xwe yên ku me ji perwerdê girtine, destpêkê wan bi bîr bînin û ji bo civaka xwe, ji bo siberoja civaka xwe bibin mirovên pêşeng."

### 'Berdêlên îro ji bo siberoja me ne'

Pişt re Hevserokê Meclîsa Gel a Mexmûrê Yusiv Kara axivî û got, "Em di pêvajoyeke welê re derbas dibin ku ji bo parastina netewe û nirxên me xeternak, dijwar, hestiyar e. Rast e we dibistana xwe di bin mercên giran de qedand, em wek Rêveberiya Meclîsa Gel her tim ji bo siberojeke zelal, ji bo di xakeke azad de, ji bo hûn bi felsefa Rêber Apo rabin û hûn bibin nifşê civaka azad bi hev re kar dikin. Ez



bawer dikim ku ev berdêlên îro li Avaşîn, Metînan, Zê (Zapê) tên dayîn ji bo serfiraziya we ne, ji bo hûn karibin jiyana xwe ya azad misoger bikin canê xwe ji bo me feda dikin. Em hêvîdar in hûn ê li siberojeke azad a ku bi fefsefeya Rêber Apo hatiye hûnandin, bijîn û siberoj û jiyana xwe misoger bikin."

Piştî axiftinan, li sînevizyona xwendekaran hat temaşekirin. Piştî temaşekirina li sînevizyonê, şano hatin nîşandan û xwendekaran stran gotin.

Xwendekar, mamoste û malbatan heta derengiya şevê govend gerand.

***ROJNEWS/MEXMÛR***

# 'Şerê man û nemanê ye'

**Nerazîbûnên li hemberî êrişên dewleta Tirkan û hevkariya PDK'ê ya bi dewleta Tirkan re, dewam dikin.**

Nerazîbûnên li hemberî êrişên dewleta Tirkan û hevkariya PDK'ê ya bi dewleta Tirkan re, dewam dikin. Nivîskar û Helbestvanê Kakeyî, Xelef Seîd ê ku bi navê Cotyar Kakeyî tê naskirin, derbarê êrişên dewleta Tirk ên ji bo dagirkirina Başûrê Kurdistanê de axivî.


Cotyar Kakeyî got, gelekî giring e niha Kurd li beramberî dijmin xwediyê yek helwêst û siyasetê bin: "Dewleta Tirk hewl dide Kurdistanê bixe rewşeke xeter. Tişta ku dewleta Tirk niha li Behdînanê dike, gelekî xirabtir e ji enfal û karesatên di dema Sedam Hisên de bi serê me de hatî."

Cotyar Kakeyî wekî din got, dîrokê piştrast kiriye ku dagirker bi girtina gir û çiyayekî tenê ranawestin û wiha dewam kir: "Niha dewleta Tirk dixwaze li Avaşîn û Metînayê cihên stratejîk bigire, heger bikare van cihan dagir bike, bê guman wê piştre dest bi dagirkirina Hewlêr, Silêmanî û Kerkûkê jî bike. Ji bona wê, ev şerê man û nemanê ye. Divê Kurd li dijî dagirkeriya Tirk yek bin û rabin."

### 'Armanc tinekirina Kurd û Kurdistanê ye'

Nivîskar Cotyar Kakeyî daxwaz ji Serokatiya Herêma Kurdistanê kir da ku li dijî dagirkeriya dewleta Tirk erka xwe pêk bîne: "Divê serokê Herêmê rê nede ti hêzeke Kurdî xiyanetê bike û hevkariya dagirkeriya Tirk bike. Divê hewl bide bi rêya Iraqê rê li pêşiya dewleta Tirk bigire û rêkarên yasayî li beramberî Tirkiyeyê bigire."

Di dawiyê de jî Cotyar Kakeyî got, "Pêwîst e li dijî dewleta Tirk, ji bo piştgiriya gerîla xwepêşandan



û çalakiyên mezin werin lidarxistin. Heger dijmin welatê me dagir kir, em ê hemû zererê jê bibînin. Dijmin ti cudahiyê naxe navbera Bozî, Kakeyî, Misilman û Mesîhiyan. Hemû Kurd in û armanca dijmin tinekirina Kurd û Kurdistanê ye."

**ROJNEWS/ÇEMÇEMAL**



# Nûrî Malikî rast dibêje

Sîpan Şînda

Her çend hinek ji me vê gotinê bi salan e dibêjin jî, lê bihîstina vê gotinê ji devê serokwezîrekî û xêrnexwazekî Kurdan bihîstin tiştekî cuda ye.

Serokwezîrê Iraqê yê berê Nûrî Malikî di axaftinekê xwe de got 'ku Tirkiye ji yek Kurdî jî hes nake'. Her çend hinek ji me vê gotinê bi salan e dibêjin jî, lê bihîstina vê gotinê ji devê serokwezîrekî û xêrnexwazekî Kurdan bihîstin tiştekî cuda ye. Ew bi salan e di nava polîtîkayê de ye û baş ew dizane ka çi fêhl û finaz, fen û fît di nava çar dewletên hov de li hemberî Kurdan têne kirin. Jiber ku ew bi xwe jî yek ji wa yê ku bi salan fen û fît li hemberî Kurdan pîkanîne ye. Lewra di rastiyê de ev gotina wî li ser xwe danek bû. Îtîrafek bû. Raste, ew weke Erebêkî û siyasetedarê kî ne razî ye ku Tirkiye axa Iraqê dagir dike. Her çend dera ku Tirkiye dixwaze dagir bike Başûrê Kurdistanê ye jî, lê belê ew herêm bi awayekî fermî di nava tixwîbên dewleta Iraqê de ye. Jiber wê ew nerazî ye.

Dewleta Tirk weke gurê har, hema li esmanê heftan ji teyrikek jî bêje ez Kurdim, êrîş dikê û tehemûla wê li ti erdê Xwidê ji Kurdan re nîne. Ev çend sal in geh li Başûr û geh ji li Rojava, heroj êrîşî Kurdan dike û dixwaze wan bifetisîne. Lê Kurdên mejî hişk jî qet vê yekê fêm nakin û gelek ji wan bi vir û zirtên siyasetmedarên tirk dixapin. Gelo heta kengê wê Kurd xwediyê vî eqilî û vî mejî bin? Gelo heta kengê wê Kurd ji xelkê re ga bin û ji xwe re golik bin? Ez nizanim, lê ya ez dizanim neyarên Kurdan jî, li halê Kurdan dikenin û keyfa wan li vê bê yekîtî û bê tifaqiya wan tê. Ew ji bivî hawî pitir keysê xwe ji Kurdan tînin û heroj ji aliyekê ve êrîşî Kurdan dikin û wan zeîftir dikin. Ew jî dizanin ku heta ew bikaribin Kurdan berdin hevdu, bê tifaqiyê di nava wan de mezin bikin û wan pirtir bikine reşê hevdu, wê ji bo wan û siberoja wan jî baştir be. Ka îca were vê li serê Kurdên "fîlozof!" bêxe! Tu devê kîjanî vedikî dibêje ez "fîlozof" im û her tiştî dizanim, lê belê dema mijar dibe yekîtiya netewî, tiştek din derdikeve holê. Gelo ka hinga mirov li derdora xwe dinêre mirov qet nikare eqilekê ji cîranên xwe jî bigire! Gotineke ya pêşiyan heye dibêjin, "Heke tu nezanî feke cîranî." Ma gelo em qet nikarine qasî misqala zire, piçek eqil ji çar dewletên cîran yên ku Kurdistan dagirkirine bigirine? Tişta ku xwiya dike ev sed sal in me negirtiye û emê negirin jî. Jiber ku eqilê gelek Kurdan ji kîsî neyarê wa ye. Ka îca neyarê mirovî wê çi rêya qencî bide nîşanî mirovî. Welhasil ez dirêj nakim. Maka hezar gotina gotineke. Ji me hez nakin bavê min ha! Vaye ew bi xwe dibêjin lê hê ji em fêm nakine.

# PDK Hespekî trûva ye

Dewletên Kurdistanê di binê dagîrkeriyê de digirin, raperînên ku bi hêza xwe ya cewherî nkarîne bitepisînin, xiyanet xistine dewrê û wisa têk birine. Sedema ku ji Harpagos heta îro Kurd ne azad in ew e ku li Kurdistanê xiyanet kirine şêwazekî jiyanê.

**FUAT KAV**

Mirov dikare bêje ku sefera Zapê ji bo dewleta Tirk sefera dawî ye. Berfirehî, kûrahî û amadekariya seferê, argûmana wê ya leşkerî û polîtîk nîşan dide ku wisa ye. Pîlansaziyek "Ne ya Bikevê û Derkeve, lê belê biqedîne û encam bigire" ye.

Hedefa sefera "dawî" danîna noqteya dawî ye. "Noqteya dawî", dixwaze têkoşîna pêncî salî ya derketiye holê di şexsê berxwedana gerîlla de tune bike. Erdogan dibêje "Emê ji Zapê biçin Garê û ji wir jî bigîjin Qendîlê û wê her tişt biqede"; Wezîrê Parastinê ya Tirk dibêje "Êdî veger tune ye, em vê carê dixwazin terorê biqedînin". Sedemê gotinên wan jî ji ber vê sedemê ye. Yanî pîlansazî li ser esasê danîna noqteya dawî hatiye amadekirin. Argûmanên polîtîk û leşkerî yên vê seferê amadekirine jî nîşan dide ku ev yek wiha ye.
Başe, xwediyên vê konsept û pîlansaziyê çima ew çend zelal û misoger diaxivin? Sedemê wê çi ye wiha tekûz diaxivin. Beriya niha jî axaftinên bi vî rengî kiribûn, bi pîlansazî û konseptên cûda hing av avêtibûn lê belê weke "Tevgera herî mezin û berfireh a Dewleta Tirk" nedidan diyarkirin. Bi rastî jî çima vê carê ew çend zelal û misoger diaxivin? Helbet di nava meselê de propaganda û argûmanên şerê psîkolojîk jî hene, lê gelo hemû ev in?

**Raperîn bi xiyanetê hatine tepisandin**

Bê gûman na. Li gorî me, di nava vê konseptê de bi esasî rastiya xiyanetê heye. Konsept, sefereke ku xwe dispêre komên kûjer ên girêdayî DAÎŞê yên ji çar aliyên cîhanê ji artêşa Tirk re hatine komkirin û li gorî vê hatiye amadekirin nîne. Di gelek seferên beriya niha de ev kom û hêz hatibûn bikaranîn lê belê encam negirtine.

**Belê, palpişta esasî ya vê konseptê xiyanete.**

Em dizanin ku dewletên serdest ên Kurdistanê dagir kirine weke qoza dawî û hêza esasî ya di sefera dawî de bikar anîne hêzên xiyanetkar bûne. Li Kurdistanê di dirêjahiya dîrokê de bê hejmar raperîn çêbûne, gelê Kurd tim li ber xwe daye û serî hildaye. Ev serhildan û berxwedan di her seferê de, belê di her seferê de bi destê xiyanetê hatine tepisandin. Dewletên Kurdistanê di bin dagirkeriyê de digirin, raperînên ku bi hêza xwe ya cewherî nekarîne bitepisînin, xiyanet xistine dewrê û wisa têk birine. Rêbaza bi xiyanetê têkbirina serhildanan her daîm qoza wan a dawî bûye. Di serî de Împaratoriiya Osmanî, Sasanî û Safevî, rejîmên Komara Tirkiye, Iraq, Îran û Suriyê yên piştre ava bûne jî heman rê şopandine, destpêkê serhildan tepisandine û piştre komkûjiyên mezin pêk anîne.

**Xaîn ew kesên herî nêzî serokên serhildanan bûn!**

Hema bêje di hemû serhildanan de xiyanet weke hespekî Truvayê hatiye bikaranîn. Dewletên dagirker û mêtinger di xalak ku nekarîna encamê bigirin de xiyaneta hûndir xistine dewrê de. Zêdetir kesên nêzî serokên serhildanê di xiyaneta hûndir de weke şûrekî tûj hatine bikaranîn.
Yê ku ji serokên berxwedana Koçgirî û Dêrsimê Alîşêr û Zarîfe qetil kiriye xwarziyê Seyîd Riza Rayber e. Dîsa yek ji pêşengên berxwedana Dêrsimê Şahîn Axa, serê wî ji aliyê birayê wî Xîdo Pîrço ve hate jêkirin û radestî qirkeran hate kirin. Ji serokên baweriyê yên berxwedana Dêrsimê Alî Axa jî bi heman rengî di encama xiyanetê de serê wî ji govdeya wî hate jêkirin û radestî kûjerên li Dêrsimê derketibûn seferê hate kirin.

Yek ji serhildanên herî mezin ên Kurdan Serhildana Bedîrxan Beg, bi xiyaneta xwarziyê Bedîrxan Beg Yêzdanşêr hate tepisandin. Ne ji xiyenata Yêzdanşêr ba îhtîmala biserketina serhildanê mezin bû. Lê belê artêşa Osmanî serhildana ku nekarî bi tena serê xwe bitepisîne bi xiyaneta hûndir a Yêzdanşêr tepisand.
Ya ku di têkbirina serhildana Şêx Seîd de roleke diyarker lîst dîsa xiyaneta hûndir bû. Yê ku Şêx Seîd da girtin û darvekirin, birayê hevjîna Xalit Begê Cîbranî û hevlingê Şêx Seîd Bînbaşiyê teqawûdbûyî Qasim Ataç e.
Di serhildana Agiriyê de jî şêwazên cûda yên xiyanetê hatiye bikaranîn. Hin êl û eşîret li dijî serhildana ku di pêşengiya Îhsan Nûrî de hatibû destpêkirin de hatin bikaranîn û serhildan bêyî ku bigîje armanca xwe hate tepisandin.
Sedemê esasî yê van serhildanên ku me bi dirêjî hewil da behsa wê bikin, rastiya xiyaneta hûndir bûye. Xiyaneta hûndir mîna hespekî Trûva mîna ku rihê gelê Kurd teslîm girtiye. Sedemê ku ji Harpagos heta îro Kurd ne azadin ewe ku li Kurdistanê xiyanet kirine şêwazekî jiyanê.

**Divê rastiya PDK'ê were famkirin**

Bêyî zanîna rastiyê û bêyî li ser esasekî rast analîza wê were kirin rastiya PDKê û sefera Zapê jî wê baş neyê famkirin. Dewleta Tirk, sîh salên dawiyê li dijî Kurdan şer kiriye, çi pêwîst be ew kiriye, ji hêzên navnetewî di asta stratejîk de alîkarî stendiye, lê belê nekarîiye encamê bigire. Çawa ku di qonaxên beriya niha de bûye, vê carê jî di devera ku nikaribe encamê bigire de dixwaze xiyanetê têxe dewrê de.
Bala xwe bidinê dema ku xiyanet xistine dewrê ew demin ku bi hêza leşkerî nekarîne serhildanan têk bibin. Sefera dawî, êrîşa dawî bi



destê xiyanetê tê pêkanîn. PDK jî tam di pêvajoyeke wiha de dixin dewrê de. Erdogan dibêje "êdî em hatin dawî, ewê bibe sala ku emê terorê biqedînin, ji bo vê em hemû hêza xwe, hemû derfetên xwe dixin dewrê de. Dostên me, hêzên herêmî, NATOya em endamên wê ne ger wê bibin alîkar, niha tam wextê wê ye. Ji berk u em di nava êrîşeke topyekûn de ne". Sedemê van gotinên Erdogan jî ji vê yekê ye. Qesta Erdogan bi "hêzên herêmî" bê gûman PDK ye. Wisa gotiye: "Dostniya me ya bi Neçîrvan Berzanî re gelek gelek cûda ye û hûqûqa navbêra me di asta pêş de ye. Di her mijarê de em hemfikirin, cûdatî di navbêra nêrînên me de tunin. Wî jî got, ewê di vê mijarê de tişta ji destê wan tê texsîr nekin..."
Ev ne dîplomasî ye û ne jî qet têkîliyeke normal e. Ev daxûyanî şêwazê ji devê Erdogan mûkûrhatineke ku di konsepta tûnekirina Tevgera Azadiyê de mîsyonek dane PDKê. Bila ti kes minemin û mizemizê nekin, hewil nedin bi awayekî din şîrove bikin û weke têkîliyeke dîplomtîk bigirin dest! Mîsyona ku dewleta Tirk û Hêzên navnetewî yên ji îdeolojiya PKKê nerehet dibin dane pêşengên Berzaniyan, mîsyona şer a li dijî Tevgera Azadiyê ye. Ti kes bila vê înkar neke û bi awayekî din negire dest!

Dewleta Tirk û hêzên navnetewî dixwazin pêvajoya tunekirina tevgera azadiyê bi destê malbata Berzanî pêk bînin. Çawa ku di serhildanên beriya niha yên Kurdan de bûye, dixwazin di vê serhildanê de jî xiyanetê têxin dewrê de. Dixwazin Malbata Berzanî weke hespekî Trûva bikarbînin û xeta Tevgera Azadiyê û serokatiya wê bê bandor bikin. Divê herkes vê bibîne, fam bike û herkes bi vî rengî li pêvajoyê binêre. Bila neyê gotin "PDK Kurdin, pêşmergeyê wê hene, ji bo Kurdan têkoşîn kiriye û loma xiyanetê nake".
Rayber jî, Qasim jî û Yêzdanşêr jî Kurd bûn. Di ser de jî Malbata Berzanî tenê bi êrîşa li dijî Tevgera Azadiyê xiyanet nekiriye û bi ketina xwîna gerîlla bi sînor nemaye, qetilkirina Saît Kirmizitoprakan jî, înfazkirina bi dehan kesên fermandarî ji Têkoşîna Azadiyê re kirine, dîsa qetilkirina bi hezara şervanên di şerê bi YNKê de jî encama vê xiyanetê ye.
Bi kûrtasî; dewleta Tirk tam di dema pes bike de Malbata Berzanî weke hespekî Trûva dixe dewrê de û dixwaze encamê bigire. Lê belê Kurd ne Kurdên berê ne. Kurd gîhiştine asta gelekî polîtîk û zane. Loma li gel gerîllayên ku li dijî xiyanet û dagirkeriya li Zap, Metîna û Avaşînê hatiye kirin berxwedaneke mezin dimeşînin wê xiyanetê têk bibin. Dujminê Kurdan dewleta Tirk wê vê carê bi xiyanetê negîje encamê û gerîlla wê xiyanetê ji Kurdistanê jêke û bavêje.

# Rêveberiya Avê 13 hezar donim erd av dide

**Li ser daxwaziya komîn û cotkaran, Rêveberiya Avê ya herêma Cizîrê 4 kenalên bendavan ji bo avdana 13 hezar donim erd vekir.**

3 sal in li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hişkesalî heye. Vê yekê bandor li sewaldarî û çandiniyê kiriye, ku ew her du jêdera sereke ya aboriya herêmê ne. Berfbarîna îsal hêvî da cotkaran, lê ji ber ku baran baş nebariya ziyan gihîşt çandiniyê. Cotkarên kantona Qamişlo yên ku zeviyên wan ên çandiniyê nêzî bendavan in, daxwaz ji komîn û meclisan kirin ku Girînendeya Avê xetên avê ji wan re vebike. Li ser wê daxwazê Girînendeya Avê ya girêdayî Desteya Çandinî û Avdanê ji 13`ê Nîsanê ve dest bi avdana 13 hezar donim erd kir.
Ji rêveberên girînendeyê Mûsa Xelef diyar kir ku wan ji bendavên Çilaxa û Zixêriyê, av dan 5 hezar donim erd. Di qonaxa duyem de jî ji bendava El-Hakimiye ya Dêrikê di 19`ê Nîsanê de av da 3 hezar donim erd û 20`ê Nîsanê ji bendava Mizgeftê ya Tirbespiyê av da 5 hezar donimî.
Mûsa Xelef da zanîn ku beşek ji 7 bendavên kantona Qamişlo ji ber rewşa



hewayê ziyan dîtine û got: "Em ê di nava çend salên bê de çareser bikin."
Li kantona Qamişlo 7 bendav hene, li navçeya Tirbespiyê Mizgeftê û Maşûqê, li navçeya Çilaxa Zixêriyê û Çilaxa, El-Hikmiyê, Sefan û Heyaka jî li Dêrikê ne.
***ANHA***





# 'Dagîrkeriya tirkî li hemberî hêza jinê bêçare maye'

Fermandara YPJ'ê Avesta Roj got, dagîrkeriya tirkî li hemberî hêza jinê bêçare maye. Hêza jinan her ku mezin dibe , dibe bingehê guhertina civakê. Eger civak were guhertin û ber bi azadiyê ve biçe, wê nikaribin bibin desthilatdar. Dema kole hebin desthilatdarî li ser piyan disekine, dema kole nebin deshilatdarî diroxe, ti wateya wê namîne.

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

Bi armanca rêxistinkirina jinên Rojava û parastina wan, 4'ê Nîsana 2013'an Yekîneyên Parastina Jinê ( YPJ ) hat avakirin û di demakê kurt de bû sembola jina azad. Her wiha li tevayî cîhanê dengveda û jinên azadîxwaz pêlbipêl tevî nava refên wê bûn. li ser girîngiya avabûna Yekîneyên Parastina Jinê (YPJ) ji bo jin û civakê , Fermandara YPJ'ê Avesta Roj bersiva pirsên me dan.

**Yekîneyên parastina jinan (YPJ) li ser çi bingehî hate avakirin û ji bo xebata xwe çi kir çavkaniya hêza xwe?**

Li Rojava bi şoreşa jinan re tovê têkoşîna azadiya jinan ya bi hezarê salan hatî binerdkirin ji nûve şîn bû. Berxwedana bi sedsalan ya azadiya jinê bi pêşengiya tekoşina azadiya gerilayên jin yên çiyayên Kurdistanê li rojava gihişt lûtkeyê. Ev bi hezar salane desthilatdar ji bo ku civakekê winda bikin di serî de êrîşî jinê dikin û hêza jinê dixin. Ji bo em bikaribin li hemberî desthilatdariyê rabin û çek rakin , têkoşîneke mezin pêwîst bû û ev nîv sedsaleke jî li xaka Kurdistanê bi pêşengiya jinên kurd ev tekoşina azadiyê bi dijwarî dimeşe. Li hemberî bê bawrebûna li dijî jinê ku jin nikare têkoşîn û şer bike , 'leşkertî tenê karê mêre' bi berdêlên mezin tekoşinekêbê hempa hat meşandin. Ev yek bi her kêliya xwe şoreşek bû . Digotin 'jin tenê dikare di xebatên rêxistinî de cihê xwe bigre' lê hebûnekî ku parastina xwe neke, ew nikare mayinde bibe, wê tenê di hinek qadên têkoşînê bimîne, wê pir lawaz bibe û aliyên din jî wê girêdayî mêr bin ku minakên wê pir hatine jiyên. Eger artêşeke were avakirin pêwîste li ser bingeke saxlem were avakirin û pêwîste fermandariya vê artêşê di bin fermandariya jinê de jî be. Eger nebe wê disa di bin serweriya mêr de be û wê bibe artêşeke desthilatdar. Wê demê ew şoreş nabe şoreş nakeve bin xizmeta gel, dê di bin xizmeta hişmendiya zilam ya deshikat de be. Lê eger di bin fermandariya jin de be wê hêza jin xurt bibe û wê bikaribe di tevayî aliyên jiyanê de parastina jin û civakê bike. Ji bo wê YPJ'ê jî bingehê xwe li ser tecrûbeyên tekoşina azadiya jinê bi armanca nûjenkirina civakekê azad danî û bi rêya şoreşê re derî ji tevahî jina vekir ku cihê xwe di nava refên YPJ'ê bigre. Ji bo YPJ'ê bû hêviya jinên cîhanê û jinên Afganistanê jî minaka herî berça ve jin êdî baweriya xwe bi hêz û artêşên mêr ku ji deshilata mêr hatîn avakirin naînin. YPJ'ê ispat kir ku tinê şoreşa li ser bingeha azadiya jinê hatî avakirin dikare xwe li ser piyan bigre.

**Tevî ku ev 9 sal di ser avabûna YPJ'ê re derbas bû, gelek gav di aliyê azadiya jinê hatin avêtin, lê heta niha şidet û kuştina derheqê jinê li bakur û rojhilatê Sûriyê tê kirin, sedema wê çi ye?**

Cihê mixabiniyê ye ku heta niha li bakur û rojhilatê Sûriyê, cihekî ku şoreş têde mezin bûye, tunditî û kuştina jinê heye. Ev zihniyeta civakê dide diyar kirin, li hemberî têkoşîna me ji aliyê zihniyeta mêr ve hê şerekî dijwar heye. Çiqasî şoreşa jinê mezin dibe, ewqas hatiye isbatkirin ku jin dikare di tevayî qadan de xabêtê bike. Ev şideta ku tê kirin, tirsa mêr ji mezinbûna hêza jinê ye. Ji bo ku hîza wê mezin nebe rastî şidet û koştinê jî tê .
Li hemberî vê yekê divê di hemû aliyan de em jin xwe xurdtir birêxistin bikin. Divê tekoşina azadiyê li her cihî belav bibe, jin li her cihî têbikoşe. Pirsgirêkên tevaya jinên rojhilata navî û cîhanê yekin, ew jî azadî ye. Cihê herî zîde dibêjin em azadin Ewropa ye, lê li wir jî





kuştin, şîdet û tecawezkirina jinê di asta herî jor de ye; jin ji bo sistema kapîtalist ya desthilad bûye amûrekî herî keftî. Ji bo wê jinên Evrupa jî berê xwe didin nava vê şoreşê. Eger em yekîtiya jinê di tevayî cîhanê de çêbikin , wê pirsgirêkên civakê li tevahî cîhanê bi dawî bibin.

**Êrişên dagîrkeriya tirkî yên ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê û qadên gerîlayan dewam dike, Hêzên YJA Starê li herêmên parastinê derbeyên giran li dagîrkeriyê dide, helwesta YPJ'ê li hemberî van êrîşan çi ye ?**

Dagîrkeriya tirkî li hemberî hêza jinê bê çare maye. Hêza jin her ku mezin dibe , dibe bingehê guhertina civakê, eger civak were guhertin û ber bi azadiyê ve biçe, ew ê nikaribin bibin desthilatdar bin. Dema kole hebin desthilatdarî li ser piyan disekine, dema kole nînbin jî deshilad diruxe, ti wateya wê namine.
Hêza me her ku diçe mezin dibe û pêl bi pêl belav dibe. Dagîrkeriya tirkî jî ji hêza jinê ditirse, ji bo wê bi tevayî rêbazan êriş dikin. Rêber Apo dibêje 'eger tu bixwazî civakekê azad û bi rêxistin ava bikey divê tu jinê rabikî'. Tirs tirsa vê fikrê ye. Sîstema dewleta tirkî dide meşandin, sîstema qirkirina jinê ye. Bê guman li hemberî van êrişan berxwednek mezin li bakur û rojhilatê Sûriyê û li qadên gerîlayan heye. Hêzên YJA Starê temenekî wanî dirêj yê têkoşîn û berxwedanê heye. Wan isbat kirin ku li tevayî qadan jin dikare têkoşînê bike, berxedana wan bê hempa ye. Me jî hêza xwe ji vê bingehê, ji vê felsefeyê girtiye. Em vê berxwedanê silav dikin û em dibêjin êdî ti hêz nikarin xwe li hember tekojina jina azad bigrin, yê winda bike wê deshilad û dagîrker bin.

# Armanca wê xwenaskirin û azadiya jinan bû

**RONÎDA HACÎ/Hesekê**

**Malda Kûsa ji bo ku gel bi çanda neteweya demokratîk ji nû ve wate bide jiyanê, dîroka xwe, çand, ked, ziman, ax û welatê xwe ji nû ve nas bike û xwedî lê derbikeve her dem di nava lêgerînê de bû.**

5'ê Nîsana 2019'an Endama navenda Jineolojiyê ya Kantona Hesekê Malda Kûsa ji aliyê çeteyên DAIŞ'ê ve bi bombeyek li ser riya Holê jiyana xwe ji dest da. Bi vê yekê xwestin derbeyek li zanista jinan bixin lê belê rêheval Malda li dijî van êrîşan bû sembola pêşxistina zanyarî û zanista ku azad dike, dibe çavkaniya civakbûnê û jiyana jinan. Malda Kûsa li Hesekê di 10'yê Çileyê de çavên xwe li cîhanê vekir, navê dayika wê Leyloh, navê bav Ebid El-Selam, li ser riya Holê di 5'ê Gulana 2019 an de gihîşt asta şehadetê.
Malva Kûsa xwişka xwe Malda bi bîr anî û wiha behsa jiyana wê kir: "Malda ji biçûkaniya xwe de dilpak e û her kesê jê hez dikir, ev teybetmendî her ku mezin bû pê re mezin dibû. Malda bi her kesî re heval bû, di malê de ya herî şêrîn û delalî bû, ew biçûka malê bû lê



xwedî zanisteke zengîn bû. Bêtir ji xwendina pirtûkan hez dikir, hem jî wênesaz bû, bêguman kesê ku pirtûkan dixwînê û yê ku naxwîne ne wekî hev e, xwendina pirtûkan zanista mirovan bi pêş dixe lewma malda her dem di nava lêgerînê de bû da ku zanista xwe bi pêş bixe. Malda Akademiya Mezbotamyayê bi dawî kir paşê di 2019'an de tevli xebatên Jineolojiyê bû."

**"Armanca wê xwenaskirin û azadiya jinan bû"**

Malva Kûsa diyar kir ku armanca Malda ya tevlibûna xebatên Jineolojiyê, xwenaskirin û azadiya jinan bû û wiha axaftina xwe domand: "Dema Malda tevli xebatên Jineolojiyê bû, pir hat guhertin, hem di milê zanistî de hemû jî di warê kesayetiyê de pir xurt bû. Malda perwerdeyan dida hêzên leşkerî û civakî. Her kes nikare vê gavê bavêje lê Malda bû bersiv û dema ku perwerde dida xwe baş amade dikir da ku bikaribe bibe bersiv ji her pirsa ku jê were kirin re. Malda li beramberî artêşek leşkeran disekinî û behsa zanista jinan dikir ev xebatekî pîroz bû ku di roja me ye îro de jinek ciwan di aliyê zanistî de kûr be û xwedî seknek bi heybet be. Ew diçû ku derê dihat hezkirin ji ber ku xwedî zanisteke zengîn bû, hezkirin ji xweşbûna zanistê dihat. Em bi şehadeta wê pir êşiyan, şehîd Malda her kêlî di nava me de dijî, em bi şehadeta wê serbilind in.

**"Şehîd Malda li hemberî îdeolojiya zayendperest di nava têkoşînê de bû"**

Rêhevala Malda Zîlan Hiso teqez kir ku her xebateke tê meşandin bi ked, fedakarî û hêza jinan e û wiha anî ziman: "Şehîd Malda ji bo azadiya tevahî jinan û belavkirina zanista jinan her dem di nava kar û xebatê de bû. Bi xebatên xwe têgihîştina çeteyên DAIŞ´ê û hêzên dagirker ku dixwazin jinan ji nû ve di nav tarîtiyê de veşêrin û her wiha îdeolojiyên zayendîperest, faşîst, dewlet-netew teşhîr kir û li hemberî van têkoşiya. Her dem ji xwe re têgihîştina neteweya demokratîk bingeh girt û bi her awayî xwest wê





bigihîjîne hemû jin û gelên herêmê û jinên Kurd, Ereb, Asûrî-Suryanî, Ermen. Ev hezkirina xwe her roj di lêkolînên xwe, perwerdeyên ku dida, guftugo û civînan de ji nû ve zindî kir û parve kir."
Zîlan Hiso da zanîn ku çareseriya pirsgirkên civakê û jinan Jineolojî ye û wiha domand: "Şehîd Malda gihîştibû wê baweriyê ku çareseriya pirsgirkên civakê û jinan naskirina Jinlojiyê ye, ji bo wê dixwset her kes di civakê de zanista jinan bizanibe lewma her dem ji bo dayîna perwerdeyan amade bû, bi hezkirin û eşqeke mezin berê xwe dida cihê perwerdeyê. Weke rêhevalên wê me hêz ji şehîd Malda digirt ku gavên girîng ji bo azadiya hemû jinan kar û xebat dikir. Em soz didin şehîd Malda û hemû şehîdên azadiyê em ê riya wan temam bikin û bigihîjin azadiya jinan, civakê û Rêber Apo ku îro bi saya felsefeya wî zanista jinan hat naskirin û çareserî ji bo pirsgirêkên civakê hat diyarkirin. Erka me ew e ku em zanista jinan belav bikin û bibin bersiv ji hemû dewletên desthilatdar re ku zanista jinan weke xeter li ser berjewendî û pergalên xwe dibînin. Malda dema diçe karê xwe li ser riya Holê bi bombeyeke li ser rê ku ji aliyê çeteyên DAIŞ'ê xistine erdê, şehîd bû. Em ê bi pêşxistina zanista jinan tola rêhevala xwe hilînin, çeteyan xwestin rê li ber belavkirina zanista jinan bigrin lê ev yek pêk nehat em hemû Malda ne û doza me yek e."
***JINHA***

# ‘Yekîtiya jinên azadîxwaz binketina dagîrkeriyê ye’

## Şervanên Yekîneyên Parastina Jinan (YPJ) êrişên deweleta tirkî ya dagîrker şermezar kirin û banga xurtkirina têkoşîna azdiyê kirin.

**Mihemed Xanim/Qamişlo**

Bi armanca qirkirina gelên azadîxwaz û têkbirina projeya biratiya gelan, dewleta tirkî ya dagirker êrişên xwe yên ser Herêmên Parastinê yên Medya û bakur û rojhilatî Sûriyê didomîne. Di nava bêdengiya cîhanê de dagîriya tirkî di van êrîşan de çekên kîmyayî bi kar tîne û sûcên li dijî mirovayiyê dike. Ji bo berjewendiyên xwe tevayiya dewletên cîhanê û rêxistinên mafên mirovan çavên xwe girtine. Li hemberî van êrîşan şervanên azadiyê li çiyayên Kurdistanê derbên giran li dagîrkeran didin û tavayiya gelên azadîxwaz jî ji şervanan re bûne pişt.

Şervanên Yekîneyên Parastina Jinê ( YPJ ) êrişên dewleta tirkî ya dagîrker şermezar kirin û ev êriş wekî sûcên li dijî mirovayiyê bi nav kirin. Herwiha bang tevayî jinên azadîxwaz kirin ku asta têkoşînê bilind bikin û li himber qirkirinê bêdeng nemînin. Herwiha diyar kirin ku bêdengî tê wateya qebûlkirina êrîşên dewleta tirkî ya dagirker re.
Şervana YPJ’ê ya bi navê Jînda Reqa êrişên dagirkeriya tirkî û çeteyên wê li dijî herêmên Parastinê Yên Medya û bakur û rojhilatê Sûriyê şermezar kir û herwiha diyar kir ku armanca êrişên dagirkiran qirkirina gelên herêmê ye.
Jinda Reqa axiftina xwe wiha domand: “Dewleta tirkî ya dagîrker hovîtiya xwe ya li dijî gelên herêmê dewam dike. Armanca van êrişan qirkirina gelên resen yên herêmê ye. Tevî ku êrişên dewleta tirkî hemû zagonên navneteweyî û pîvanên mafên mirovan binpê dike jî, lê hemû saziyên pêwendîdar yên Neteweyên Yekbûyî li hemberî kiryarên dagirkeriyê xwe bêdeng dikin.”

**‘Pêvista tevahî jin li hember planên dagîrkirina Kurdistanê şiyar bin’**

Jînda Reqa bang li jinên azadîxwaz kir ku yekrêziya xwe bihêztir bikin da planên dagirkeran vala werin derxistin û axaftina xwe wiha qedand: “Pêwîste jin li hemberî planên dagîrkeriya tirkî hişyar be, tenê projeya biratiya gelan wê karibe dagirkeran têk bibe. Yekîtya gelên herêmê wê serkeftinê misoger bike. Eger dagîrkerî biser bikeve, wê jinên herêmê ji her kesî zêdetir rastî zordariyê bên.”
Şervana Ereb ya bi navê Leyla Reqa êrişên dagîrkeriya tirkî wekî dewamiya planên hêzên desthilatar yên ku dixwazin gelên herêmê kole bikin dît û wiha dewamî da axaftina xwe: “Dewleta tirkî ya dagîrker bi armanca firekirina projeya xwe ya dagîrkirinê û bi alîkariya hêzên rojavayî , asta êrişên xwe yên li dijî qadên gerîlayan û bakur û rojhilatê Sûriyê zêde dike. Bi van êrişan dixwaze xwena Impratoriya Osmanî zindî bike. Tevaya hêzên desthilatdar dibin yek û ji bo şikandina gelên azadîxwaz tevdigerin. Yekîtiya jinên azadîxwaz dikare van planan vala derxe û dagîrkeran bişkîne.”





**‘Li hember qirkirinê divê jin tevlî nava refên berxwedanê bibin’**

Leyla diyar kir ku ji ber têkçûna dagîrkeriya tirkî li çiyayên Kurdistanê wê dest bi karanîna çekên kîmyawî kiriye û wiha got: “Di rojên dawî de, dewleta tirkî êrişên xwe li ser herêmê zêde kiriye. Ji ber têkçûna wan li Herêmên Prastinê yên Gel (MEDYA ), ew bi awayekî hovane êrişî her derê dikin. ji ber ku wan xwe li hemberî berxwedana gerîlayan negirt, careke din dest bi karanîna çekên kîmyayî kir. Bi saya fikir û ramanên Rêber Apo û berxwedaniya dîrokî ya şervanên azadiyê, wê Siyasetên dagîrkeriya tirkî li her çar perçeyên Kurdistanên têk biçe.”
Leyla Reqa di dawiya axaftina xwe de ji jinên herêmê xwest ku helwesta xwe nîşan bidin û tevlî nava refên berxwedanê binin. Herwiha bang li tevaya jinên azdîxwaz yên cîhan kir ku piştgiriya yekîneyên Parstina Jinê ( YPJ ) û YJA Star’ê bikin û yekîtiya jina azad li ser asta cîhanê pêk bînin.

# Pêşmergeyê Dêrîn: Li hemberî dagîrkeriya dewleta tirkî serî rakin û piştgiriya PKK`ê bikin

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

**Mam Hidayet got, dewleta tirkî ya dagîrker dijmina gelê Kurd e. Dixwaze seranserê Kurdistanê dagîr bike û Kurdan qir bike. PKK jî têkoşîna azadiya gelê Kurd dike. Ji ber wê divê em piştgiriya PKK`ê bikin û li hemberî dagîkeriyê serî rakin.**

Li hemberî êrişên dewleta tirkî ya dagîker yên ser Herêmên Parastinê yên Medya, pêşmergeyê kevin yê başûrê Kurdistanê Mam Hidayet Mihemed Emîn helwesta xwe nîşan da û ji me re axivî.

**`Ji bo azadiya gelê Kurd me li Başûr û Rojhilat pêşmergetî kir`**

Mam Hidayet da zanîn ku ji ber dagîrkerî, zilm û zordariya rêjima BEES`ê ya Iraqê rabûne ser piyan, çek rakirine û bûne pêşmergeyên gelê xwe û axiftina xwe wiha domand: “Têkoşîna me ne ji bo Başûr tenê bû. Armanca me azadî, aramiya gelê Kurd û rizgarkirina Kurdistanê bû. Azadî û aramiya gelê me jî bi roxandina vî dijminê xwînrêj pêkan bû. Ji ber wê jî tenê riya şerê biçek hebû, me jî ew hilbijart. Li ser bingehê yek çarenûs, em bi hawara têkoşîna Kurd ya Rojhilat ve çûn û me li hemberî rejima dagîrker ya Îranê jî xebat kir.”

**`Dewleta tirkî bi çavê dijmin li tevayiya gelê Kurd dinêre`**

Mam Hidayet herwisa li ser êrişên dagîkeriya tirkî, bertekên xwe nîşan dan û wiha axivî: “Dewleta tirkî ya dagîrker her tim û bi awayekî eşkere teqez dike ku dijmina gelê Kurd e. Divê em jî bi yek çavî û yek helwestê li vê dewletê binêrin, ew dewleteke dijmin, dagîrker û qirkera gelê Kurd e. Herwisa ez helwesta şermoke û lewaz ya partiyên siyasî yên başûrê Kurdistanê şermezar dikim. Jixwe helwesta wan, ciyê nerazîbûna gelê Kurd e. Lê ji vê kambaxtir ew e ku Partiyê Demokrat ya Kurdistanê (PDK) eşkere rênasî û hevkariyê ji dagîkerên tirk re di êrişên wê de dike. Başûrê Kurdistanê û deskeftiyên wê pêşkêşî dijmin dike, da ku êrişî PKK’ê bike. Ji bo qirkirina gelê xwe dixebite, ev ciyê şermezarî û mixabiniyê ye. Çima PDK dema ku xortên welat rabûn ser piyan, daketin xwepêşandanan û dawa azadiya xwe kirin, berê tifingên xwe dan singa wan û bi tevayiya hêza xwe êrişî wan kir? Lê dema dagîrker bi tank, top û balafirên xwe êrişî zarokên gelê Kurd dike, rê ji dagîrkeran re vedike!.”

**`Li hemberî dagîrkeran serî rakin`**

Mam Hidayet herwisa bal kişand ser têkoşîna PKK`ê û got, têkoşîn û armanca PKK’ê armanca me ya ber’ bi salan e ku me li hemberî dijminê gelê kurd çek rakir. Ew jî li hemberî dagîrkerî û faşîzmê dixebite.
Pêşmergeyê kevin Hidayet Mihemed Emîn bi vê peyamê axaftina xwe bi dawî kir: “Pêwîst e ku gelê Kurd li seranserê Kurdistanê, piştgiriya vê têkoşîna azadiya gelê Kurd bike. Di vê pêvajoya giran ya li Kurdistanê de divê tevayiya gelê Kurd, dakeve qadan û helwesta xwe ya li dijî dagîrkeriyê reva bike. Lewra ev ne pêvajoyeke normal e, îro xeter mezintir bûye. Mesele hebûn û tinebûna gelê Kurd e. Pêvajoyeke ku dijmin dixwaze welat tevî dagîr bike. Jixwe me sala 2017`an Kerkûk û gelek bajarên Kurdistanê ji dest dan. Li Rojava jî Efrîn û bajarên din dagîr bûn. Çend salên din dibe ku xaka me tevî dagîr bikin. Erdê Kurdistanê pîroz e. Ev dem dema serîrakirinê ye, pêwîst e gelê Kurd serî rake.”



## FENER



### Konsept mezin e armanc jî yek e

**Idrîs HENAN**

Ji her kesî pirtir, civaka me ya Êzîdî wek ferd û kom, hîmê sêyemîn yê hebûnê ji dest dabû. Tenê li ser her du hîmên din ên “xwexwedîkirin û xwezêdekirinê” û bi lêhatineke dîrokî wisa zîndî mabûn! Jixwe ew lingê “xweparastinê” ji berî 74 fermanan vir ve hatibû birrîn. Bi gotineke din; civaka me ya Êzîdî ne tenê mirovatî, rûbirûyî cureyeke êrişên ku zindewariya wê eleqedar dike mabû. Weke zindewarekî jî nedihat hesibandin. Ji ber wê bi hemû cureyên inkar û fermanên qirker re rûbirû dima û bi êrişên li pey hev, keviyên hebûna wê, weke çi zindewarekî dîtir be, li ber kirtîne bû. Di çarçoveya giştî ya qirkirina gelê Kurd de, pêkhateya êzîdî weke hebûn û bawerî, rastî hemleyên dîrokî yên qirkirin û inkarê hatiye. Eger hewce neke mirov bi dehan fermanên berê bijmêre, tekez hewce heye fermana herî dawî bi bîra mirovan were. Ango fermana piralî ya 2014’an ku bi destê “hikûmetên Bexda, Hewlêr û DAIŞ” pêk hatiye û bi koordîneya NATO û Tirkiyê bi rê ve çûye. Wê çaxê jî, di eksena şerê topyakûn ê li dijî hebûna gelê Kurd de, hebûna civaka me ya êzîdî weke hedefa destpêkê hate destgirtin. Dixwestin; bi şikandina xeta yekem a resentiya civaka Kurdan, axê dagir bikin û nirxan talan bikin. Ji wê bêtir; armanca wan kokqelandin bû. Ji ber vê jî çiqas êriş hebin, di pênaseyên wan ên teng û fireh de tunekirin sernavê sereke bû.
Bi kiryarên tunekirina fîzîkî, êrişî reh û kokên civakê dikin. Jê û pê ve, xwezayê diqelînin û her tişta ku behsa resentiyê dike hildiqetînin. Ji ber vê jî; îroj li Efrînê û Serê Kaniyê texrîbatên herî mezin pêk tên. Darên sedan salan ku kêlikên hezarê salan hembêz dikin, dibirrin û ji hestiyên bav û kalan tol hil didin. Ji ber bê çandiya xwe, bi kîn û nefretek mezin bi ser de tên û ji holê radikin. Tişta ku îro li Şengalê diqewime û yê berê qewimiye jî, heman zihniyet û hişmendiya talankar a Bass-Toranî ye. Bi ruhekî neteweperest û nijadperest kîn û ajoyên xwe têr dikin û bi hovîtiyeke bê mînak êriş dikin. Ji lew re jî; jinên me doh li Şengalê û îroj li Efrînê li bazarên koletiyê tên firotin û kirîn.
Ji ber wê jî darên me yên “Mirazan” tên birrîn û qutkirin. Pîroziyên me tên binpêkirin û tadeyên herî xirab, li wan herêman, tên kirin.
Îroj konsept mezin bûye lê armanc yek e. Çendîn navê lîstikvanan hatibin guhertin, lê hemû jî derçûyên heman dibistana qirker in. Xwedî bernameyên taybet û wek hev in. Li beramberî kirîz û aloziya zihnî, siyasî û aborî ya dagirkeran, kaoseke hişmendî ya xeta xwefiroş a hundirîn jî heye. Ji ber wê sedemê; hêza wê nîne li derveyî çarçoveya dagirkeran bijî û di pêşbirka xwefirotinê de, ji her kesê wêdetir bi ser dikeve. Di heman demê de, ji neyaran pirtir neyartiyê dike û jê zêdetir dijminatiya esl û cinsê xwe dike.
Ya ku li Herêmên Parastina Medya, Şengal, Serê Kaniyê, Girê Spî û Efrînê serperştiya hemleyên inkar û qirkirinê dike, ew xeta han e. Fena serê mar in, eger ne ji xulamtiya wan bûya, dijminê me nediwêre ber bi me ve jî binêre. Yên li Şingalê êriş dikin, ji hikûmeta Iraqê wêdetir, hewldarên fermana 75’an in.



# ‘Dagîrkeriya li ser Kurdistanê tecrîda li ser Rêber Apo ye’

## Welatiyên bakur û rojhilatê Sûriyê gotin, dewleta Tirkan ya dagîrker û hêzên komploger, ti caran naxwazin gel azad bibe. Ji ber wê tecrîdeke girankirî li ser Rêber Apo dimeşînin û bi dîlgirtina Rêber Ocalan qirkirina Kurdan dikin armanc.

**Darîn Silê/Qamişlo**

Tirkiye bi salan e tecrîdeke giran li ser Rêber Apo pêk tîne. Rojbiroj tecrîdê girantir dike û êrişên xwe li ser gelê Kurd zêdetir dike. Gelê Kurd jî dibêje, ‘êrişên ku niha tên kirin jî tev dewamkirina Komploya Navnetewî ye’.

Ev 24 sal in Rêber Abdullah Ocalan li zindana Îmralî di binê tecrîdeke giran de ye. Dewleta tirkî û hêzên komploger yên pê re alîkar xwestin bi vê komployê gelê Kurd tine bikin û felsefeya rêberê gelê kurd Abdulah Ocelan ji gel qut bikin. Di fikrê wan de wisa bû ku wê bi girtina Rêber Apo, fikir û têkoşîna azadiyê bifetisînin. Lê Rêber Apo bi fikir û felsefeya xwe herwiha bi têkoşîna xwe gelê azadixwaz xurttir kir. Herwiha gelê kurd ev 24 salin li dijî bê hiquqa li ser Rêber Apo li tevayiya cîhanê têdikoşin û bang li gelên cîhanê dikin ku bêdeng nemînin.
Ji bo şermezarkirina tecrîda li ser Rêber Abdullah Ocalan, herwiha şermezarkirina kiryarên Tirkiyê yên ku dewamkirina komployê dikin, welatiyan nêrînên xwe ji me re anîn ser ziman.

**` Tecrîda li ser Rêber Apo tirsa dilê dagîrkeran e`**

Welatiyê bi navê Selah Dîn Helbo da zanîn ku Rêber Apo rêberê mirovayiyê ye, ji ber wê heta sax bin wê li hember tecrîda dij mirovahiyê têbikoşin û wiha dirêjî da axaftina xwe: “Tecrîda ku li ser rêbertî tê kirin bi armnca tinekirina projeya Neteweya Demokratîk e ya ku bi fikirê Rêber Ocelan hatiye avakirin. Fikirê Rêbertî fikrekî demokrat û pêşketî ye. Ji ber wê dewleta Tirkiyê ya faşîst û hevkarên wê, ji fikrê Rêbertî ditirsin û roj bi roj tecrîdê giran dikin. Lê ew çiqas tecrîdê bimeşînin, emê jî fikrê rêbertî yê ku di mejiyê me de hatiye çandin xurttir bikin. Yekem Partiya Karkerê Kurdistanê (PKK) ku bi rêberiya Serok Apo hat avakirin, bi milyonan mirov tevlî bûn û li ser fikrê rêbertî berxwedan û têkoşîn kirin. Çimkî ev fikir çareseriyek ji bo mirovayiyê ye.”



**‘Dagîrkeriya li ser Kurdistanê tecrîda li ser Rêber Apo ye’**

Selah Helbo got, Dagîrkeriya ku li ser Kurdistanê tê kirin, tecrîda li ser Rêbertî ye û ev yek li axaftina xwe zêde kir: “Êrişên ku li ser herêmên Parastina Mediya, Şingal û Rojavayê kurdistanê tên kirin, tev girêdayî tecrîda li ser rêbertî ne. Tirkiye dixwaze destkeftiyên gelê Kurd têk bibe, herwiha projeya Neteweya Demokratîk û biratiya gelan bêbandor bike. Yê ev proje danî Rêbertî bû. Ji bo wê jî têkiliyên gel û rêbertiyê qut kiriye.”
Selah Dîn Helbo di dawiyê de bang li gelê kurd yên her çar parçên kurdistanê kir ku her roj derkevin qadan û banga azadiya Rêber Apo bikin. Herwiha got, azadiya serok Apo azadiya tevayiya gelê kurdistanê ye. Çimkî ne bi azadiya Rêbertî be, ne mumkine ku em azad bibin.



**`Pêwîste bang û têkoşîna ji bo azadiya Rêbertî bê navber were kirin`**

Welatiyê bi navê Mûsa Elî jî behsa pêngava dem dema azadiyê ye kir û wiha got: “Dema em dibêjin ‘Dem Dema Azadiyê ye’ tê wateya ku pêwîste em rêberê xwe azad bibînin û ji nava çar dîwaran xilas bikin. Demek dirêj di ser pêngava ‘azadiya rêbertî’ re derbas dibe. Ne ji niha ve, ji roja ku hêzên komploger Rêbertî girtin û komplo pêk anîn, me dest bi ‘pêngava azadiyê’ kiriye. Lê pêwîste bang û têkoşîna ji bo azadiya bê navber were kirin.”
Mûsa Elî di dawiyê de got, wek gelê bakur û rojhiêatê Sûriyê divê em di milê fikir û felsefeya demokratîk de xwe pêş bixin û helwesta xwe di milê siyasî, leşkerî û civakî de bidin nîşandan. Herwiha pêngava azadiyê ya ku me hê bi ser nexistiye, çimkî me rêberê xwe azad nekiriye, divê em bi ser bixin. Wê demê wê rêberê me jî azad bibe û wê jiyana me jî ronî bibe. Çimkî azadiya me azadiya rêberê me ye, heta em rêberê xwe azad nebînin, em xwe azad nabînin.



# `Divê wijdana cîhanê qirkirineke nû li Şingalê qebûl neke`

**Serbest Etê/Qamişlo**

**Endama Baroya Yekîtiya Jina Êzîdî got, Rêveberiya Xweser ya demokaratîk ya Şingalê Hêviya gelên Iraqê ye. Ji ber wê bi organîzekirina dewleta tirkî ya dagîrker û pêkanîna hevkarên wê qirkirna Êzîdiyan didominin. Lê divê wijdana cîhanê qirkirineke nû ya Êzîdiyan qebûl neke.**

Piştî peyama 9`ê Cotmeha 2020`an ya Tirkiye, Hikumeta Iraqê û PDK`ê imze kirîn, êrşên ezmanî yên dewleta tirkî ya dagîrker û hewldan û êrişên artêşa Iraqê, li hemberî Xweseriya Demokratîk Ya Şingalê bênavber didomin. Herî dawî artîşa Iraqê 2`yê Gulanê bi tank, top û çekên giran êrişî hêzên Êzîdxanê yên navçeya Sinûnê ya Şingalê kir û malên walatiyan topbaran kirin. Di encamê de şervanekî YPŞ`ê şehîd bû û sê walatî jî birîndar bûn.
Têkildarî êrişên ser Rêveberiya Xweser ya Şingalê û hêzên Êzîdxanê, endama Baroya Yekîtiya Jinên Êzîdî ya Helebê Ranya Cefer ji rojnameya me re axivî.

**`Bi saya şervanên Êzîdxanê herêm ji çeteyên DAIŞ’ê hat parastin`**

Ranya bîr xist ku piştî hewldana qirkirinê û fermana 3`yê Tebaxa 2014`an ya bi destê DAIŞ`ê, şervanên Êzîdxanê û gerîlayên PKK`ê ew herêm ji destê van çeteyan paqij kirin û ev nirxandin kir: “Bi saya berdêl û têkoşîna wan jî Rêverberiya Xweser ya Demokartîk Ya Şingalê ava bû. Ev xweserî ji civaka Êzîdî, gelê Kurd û tevayiya gelên Iraqê yên azadîxwaz re bû hêviyeke mezin. Lê desthilatên dîktator yên li Enqere, Hewlêr û Bexda ji vîna azad ya gelan ditirsin. Li ser vî bingehî peyman û êrişên hevbeş yên dewleta tirkî ya dagîrker, hikumeta Kazimî û PDK`ê, li ser Xweseriya Şingalê bênaveber didomin.”

**`Plan dagîrkirina Kurdistanê û xaka Ereban e`**

Endama Baroya Yekîtiya Jinên Êzîdî ya Helebê herwisa bal kişand ser rola dewleta tirkî ya dagîrker di plan û êrişên ser Xweseriya Demokartîk ya Şingalê de û axaftina xwe wiha domand: “Tirkiye bi amanca ku xewna Osmanî û Mîsaqa Milî di sedesala 21’ê de vegerîne, êrişan organize dike û her du hevkarên xwe Hikumeta Iarq û PDK`ê erkdar dike. Hewl didin ku Şingalê ji Iraqê û başûrê Kurdistanê ve qut bikin, herwisa Şingal ji Rojava bi riya lêkirina dîwar qut bikin. Ji ber wê ol û civaka Êzîdî ya ku mîrata Kurdan parastiye, dikin amanc. Bi peymana 9`ê Cotmehê dixwazin koka gelê Kurd di riya civaka Êzîdî de biqelînin. Ji ber wê dewleta tirkî ya dagîrker êrişî başûr û qadên gerîla dike û PDK` jî hevkariya wê dike. Heman demê hikumeta Iraqê bi destekdayîn û bi propagandaya PDK`ê êrişî xweseriya Şingalê dike. Armanc dîsa dagîrkirin û qirkirina gelê Şingalê ye. Lê vê carê ev xeter e, wê di erdnîgariya Şingalê tinê de sînordar nemîne, di planên Tirkiyêde dagîkirina Başûr û Iraqê tevê heye. Ji aliyekî din ve jî, dixwazin Rojava dorpêç bikin û Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê lewaz bikin.”

**` Îro Şingal be, sibe wê tevayiya Iraqê be`**

Endama Baroya Yekîtiya Jinên Êzîdî ya Helebê Ranya Cefer teqez kir ku wê ev êriş vîna civaka Êzîdî û gelên azadîxwaz nikaribin bişkînin û axaftina xwe bi vê peyamê qedand: “Wek Êzîdiyên Rojava, banga me ji gelê Kurd, Ereb, Xiristiyan û tevayiya gelên Iraqê re ew e ku, li hemberî êriş, siyaset û kompoyên qirkirinê, xwedîhelwest bin. Divê dayîk û jinên Başûr û Iraqê, zarokên xwe tevlî êrişkaran nekin. Lewra mixabin, em di sedsala 21’ê de ne û hê Kurd hevkariya dagîrkeran dikin. Dewleta tirkî, Hikumeta Iraqê û PDK dixwazin fitne û dekûdolaban di nava gelan de biafirînin. Li ser vî bingehî ji aliyekî din ve êrişên reşkirina civaka Êzîdî li nava civak û gelan didome. Bi siyaseta reşkirinê, rojane fermanan li ser civaka Êzîdî pêk tînin. Divê Saziyên Mafên mirovan û cîhan tev berxwedana mafdar ya Êzîdxanê, rewa bibînin û li hemberî plan û êrişan, wijdana mirovayiyê bilive û qirkirineke nû qebûl neke. Jixwe ku îro Şingal be, sibe wê tevayiya Iraqê be.”





## Dîsa Şingal

**Faruk Sakik**

Di 3’yê Nîsanê de, di ANF’ê de nûçeya bi sernivîsa; ‘Fîlmê ‘Hêza’ xelata xwe ya sisiyan li Los Angelesê girt’ bala min kişand. Naveroka film wiha bû: Di sala 2015’an keçeke Êzîdî li Şingalê ji aliyê DAIŞ’ê ve hatiye revandin. Pişt re bi awayekî rizgar dibe û tevlî nava refên şervanên YPJ’ê dibe. Piştî tevlîbûnê, hem tola xwe digire û di heman demê de tola hemû kesên di wê fermanê de hatine qetilkirin digire.
Piştî fermana Şingalê wek vî fîlmî, gelek pirtûk hatin nivîsandin, gelek film û dokumanter hatin çêkirin. Bi navê Nadiya Mûrad kesek xelata Nobelê ya aştiyê girt. Stran û lorîn hatin qîrkirin. Di meş mîtîngan de fotografên ku wê demê hovîtiyek bi çi rengî li Şingalê hebûye hatin bilindikirin. Ewqas!!!
Lê bi saya şervan û gerîlayên Kurdistan, Şingal rizgar û azad bû. Kurdan li vê derê birînên xwe bi destê xwe peçan. Rêveberiya Xweser îlan kirin. Di vê sîstemê de di meclîsên hatine avakirin de, cîh dane hemû ol, bawerî, civak û neteweyan.
Li Şingalê di bin yek asûmanî de azad dijiyan. Ji bo parastinê hin hêzên leşkerî bi nave YBŞ ava kirin. Azad bûn…Ev azadbûna wan gelek hêz û dewletên heremê aciz dikir. Û ev hêz dîsa şûr û mertalê bav û kalê xwe ji dîwar anîn xwar û berê xwe dane Şingalê.
Piştî di navbera Rûsya û Ukranya de şer dest pê kir xetên gaz û niftê ji nû de hatin xêzkirin. Pênûs di dest wan de û nexşeya rojhilat li pêş wan ser Şingalê xêz dikirin. Hevserokê Konsêya Rêveber e KCK’ê Cemîl Bayik jî got; “xet û boriyên gazê di Kurdistan de derbasî Ewropa dibin ji bo vê yekê berê xwe dane Kurdistan.”
Baş e lê çima Şingal? Şingal di navbera Başûr û Rojavayê Kurdistan de cîhek pir stratejîk e. Di heman demê de ji bo dewletên heremê û Amerîka jî deverek stratejîk bû.
Dijminê kurdan ev herêm ji bo vê yekê ji xwe re kirin hedef. PDK jî parçeyek vê plana ku li Şingal ketî meriyetê de cîh digire. Ew jî li du paqijkirina lekeya reş a sala 2014’an.
Kî tune ye ku ji bo berjewendiyên xwe berê xwe ne dabe Şingalê? Bifikirin kesek wek Kazimî jî ku di mala xwe de nikare bibe desthilatdar, li ser Şingalê hisaban dike.
Baş e ev dijmin û PDK’î ne, em wan derbas bin. Lê wan saziyên ku xelat didan, nivîskarên ku pirtûk dinivîsîn, derhênerên ku film û dokumanter çêdikirin, stranbêjên ku li ser Şingal stran çêdikirin; hûn li hemberî êrişên li ser Şingalê çima îro bêdeng in?
Gelo hûn li bendê ne komkujiyek din pêk were û ji were firsendên berhemên nû derkevin. Îlhama nivîsandina pirtûk û senaryoyan li we peyda bibe. Li ser êş û xwînê hilberadina hunerê pir şerm e. Hunermend ew e ku pêşî li zilmê û şeran bigire. Nabe ku her wek di kemînê de li benda nêçîra xwe bisekine.
Îroj hêj komkujî destpênekirî; film, stran, helbest, pirtûkên xwe li ser hewldanên êriş, plan û peymanên dagirkirina Şingalê çêkin da ku trajediyên wek sala 2014’an neyên dubarekirin. Helwesta mirovahiyê ya bi wijdan eve. Divê ku hûn balê bikişînin li ser metirsiyên mezin ê paşeroja Şingalê.
Ev car wê wijdanê we destûr nede ku hûn carek din li ser êş û azarên Êzîdiyan, ji xwe re lotika bavêjin. We gelek lêkolîn kir û hûn bûn şahid ku di fermana 73’yan de li wê axê, li wê Şingalê çiqas êş hebû. Dive hûn li gorî vê yekê tevbigerin.